

Klamîdya, agahdarî ji bo nexweşan (2016-10-21)

Belavoka doktorên rêlibegirtina nexweşîyên vegir.

Çima ev agahdarî ji te re hatine?

Nexweşîya klamîdiyayê bi rêya kesên din li ba te peyda bûye yan şik heye ku ew li ba te peyda bûye. Agahdarî derbarê klamîdiyayê, ew çawa tê çare kirin û ka divê tu çi bikî di vê belavokê de hene.

Klamîdya çi ye?

Klamîdya bakterîyek e ku piranîya caran xwe di perdeyên çilmokî yê borîyên mîzê, vajînyayê û rûvîya qûnê de bi cih dike. Mimkin e ew carinan di gewrîyê de jî hebe. Mimkin e ku klamîdya di demekê dirêj - carinan çend salan - de li ba mirovî hebe bêyî ku mirov pê bihese.

Çawa klamîdya li ba mirovî peyda dibe?

Bi awayekê serekî, klamîdya bi rêya sekskirina bêparêzî, çi sekskirina vajînyayê yan sekskirina qûnê be, û hin caran bi rêya seksa devî belav dibe. Mimkin e ew bi vemalîn* û lîstikên seksê jî belav bibe.

Klamîdya bi rêya kinc, destmal û tuwaletan belav **nabe** ji ber ku bakterî nikarin li derveyî laşî bijîn. Mimkin e klamîdya çend caran ji kesên din li ba mirovî peyda bibe.

*vemalîn = “seksa mistdan û destkirinê”, ku mirov laşên hevûdin vemale û mist bide bêyî ku seksê bike, veresandina mişterek.

Mirov pê dihese ku klamîdya li ba mirovî heye?

Nîşan li ba piranîya kesên yê ku nexweşî bi rêya kesên din lê peyda bûya xuya nabin, ango mirov pê nahese ku enfeksiyon li ba mirovî peyda bûye.

Li ba hin kesên mîstin hinekê bijan e.

Mimkin e avrêjên bixwîn û/yan êş li aliyê jêrê yê zikî li ba jinan peyda bibin. Mimkin e avrêj ji borîya mîzê û êş di kîsikê gunan de li ba mêran peyda bibin. Heger mirovî seks di rêya qûnê re kiribe, mimkin e avrêj ji rûvîya qûnê derkevin.

Klamîdya gelek vegir û belavbar e tevî ku nîşan li ba mirovî xuya nebin jî.

Ma klamîdya bixeter e?

Heger çareya nexweşîyê neyê kirin, mimkin e borîya falopî ya hêkan li ba jinan birîndar bibe û ev dikare bibe sebeb ku êdî zarokçêkirin zehmet bibe yan piz li derveyî malzarokê (hamîlebûna derveyî malzarokê) mezin bibe. Mimkin e enfeksiyona sergunikan (epididymis) li ba mêran peyda bibe. Klamîdya dikare bibe sebeba kulbûna çavan û carinan êşa movikan jî.

Çawa klamîdya tê çareser kirin?

Klamîdya bi antîbîyotîkan (heban) tê çareser kirin. Enfeksiyon namîne heger tu heban li gor tewşîyeyê bixwî û li gor şîretên ku ji te re hatine dayîn bikî. Îlackirin belaş e.

Divê tu cardî werî klînîkê heger serdana doktorî dîsa ji te bê xwastin.

Heger klamîdya li ba te hebe, **divê tu rîskê nekî ku nexweşîyê bigihînî kesekê din**. Çareya herî emîn û ewle ew e ku tu têkilîya cinsî yan corên din yê seksê - ango 10 rojan - nekî heta ku îlac temam dibe. Heger tevî wê jî tu seksê bikî, **divê** tu ji wî kesî re bibêjî ku klamîdya li ba te heye û **divê** hûn tiştêkê parêzîyê - kondom yan femîdomê - bi kar bînin.

Maneya Lêgerê nexweşên vegir çi ye?

Gelek giring e ku kesên xwedî klamîdya bîn dîtî da bîn îlac kirin ji bona ku rîska zerarbûnê bê kêmkirin (li jorê binêre) û ji bona ku enfeksiyon belavî kesên din nebe.

Heger klamîdya li ba te hebe, divê tu ji lêgerê nexweşên vegir re bibêjî ka te sekskirin yan têkilîyên cinsî - heta berî salekê jî - bi kê re kirine.

Tiştên ku tu ji lêgerê nexweşên vegir re dibêjî nihênî (sirveşartî) dimînin. Kesên ku tu behsa wan dikî dê nizanibin ka tu kî yî. Ew dê tenê bizanin ku divê ew tehlîlên xwe bigirin.

Klamîdya di qanûna rêlibergirtina nexweşîyên vegir de heye - maneyê wê çi ye?

Hin rêbaz û qaîdeyên ferz di qanûna rêlibergirtina nexweşîyên vegir de hene ku nexweşîyên wek klamîdyayê rawestînin da ku ew belavî kesên din nebin. Heger klamîdya li ba te hebe yan şik hebe ku ew nexweşî li ba te heye, **divê tu wan rêbaz û qaîdeyên ferz** yên ku doktorê te dide **bi cih bînî**.

- Divê tu serdana doktorî cardî bikî heger ew bixwaze.
- Divê tu ji wî kesî re yê ku tu seksê pê re dikî bibêjî ku klamîdya li ba te heye yan mimkin e li ba te hebe.
- Heger îlaca te hêj temam nebûbe, divê tu tiştêkê parêzîyê bi kar bînî gava tu seksê dikî.

Heger rêbazek yan qaîdeyeka ferz ya ku tu bawer dikî ku şaş e ji te hatibe xwastin, tu dikarî têkiyê bi doktorê rêlibergirtina nexweşîyên vegir yê li parêzgeha te re bikî.

Tu dixwazî hêj bizanî?

Agahdarîyên zêdetir li ser klamîdyayê li vê derê hene:

www.1177.se

www.folkhalsomyndigheten.se

www.umo.se (klînîka ciwanan di înternetê de)

Goşeya agahdarîyan ya dilxwazî (*frivillig informationsruta*)

Yê ku te ditiye (*Du har träffat*)

.....

Tarîxa veqetandî ya lêgerîna nexweşên vegir (*Smittspårning bokad datum*)

.....

Serdana cara bê (*Nästa återbesök*)

.....

Nimre û demên telefonê yên klînîkê (*Telefonnummer/telefonid till mottagningen*)

.....